



## Perwerdehiya erênî bi „Modela Tabûre“

Li perwerdehiyeke baş tabûreyekê bi 3 lîngan ve bifikrin. Her 3 lîngan hewce ne, an na wê tabûre dê bizeliqe.

Van 3 tiştan dibin alîkar da ku zarokê/a we bi tenduristî mezin bibe:

- ✓ **Dilovanî**, da ku zarok hîs bike ku tê hezkirinê.
- ✓ **Hebûna çarçove** bi riya plansaziyek baş û qanûnên zelal, da ku zarok karibe riya xwe li cîhanê bibîne.
- ✓ **Piştgirîkirin di mijûlbûna bi hest de**, da ku zarok di jiyane de baş bijî.



©2020 Prof. Dr. Charlotte Hanisch, serokê Psikolojî û Psikoterapiyê li Zanîngeha Kolnê di Perwerdehiya Çareseriyê û Rehabîltasyonê de. Materyal li gorî naveroka ADOPT perwerdehiya serhêl ya dê û bavan e û wekî beşek ji projeya multimo bi hevkarîya Prof Dr. Thomas Hennemann, Serokê Arîkariya Perwerdehiyê û Pêşkeftina Civakî-Hestî hatiye bikaranîn. Têkilî: multimo-schule@uni-koeln.de. Wêne: Burkhard Piller.

## Dilovanî/Evîn



Nîşandana nêzîkbûna  
fizîkî (mînakî hembêzkerin,  
ramûsandin)



Nîşandana awayên cûda yên  
dilovanî û evînê




Pêşkeşkirina Alîkariyê (mînak,  
alîkarî di karên nû de)



Xelat û diyariyên biçûk (mînak, peyamek  
têxin qutiya firavînê)



Dem bi hev re derbaz bikin (mînak,  
dema lîstinê an dema çirokê  
destnîşan bikin)



Evînê bi ziman bînin (mînak,  
bêje "ez ji te hez dikim")



Têbînî: Bi awayên cûda ji zarokê/a xwe re nîşan bidin ku hûn ji wî/ê hez dikin.  
Binerin ka hûn kîjan awayê herî zêde bikar tînin da ku jibo hefteya bê hûn  
bizanibin awayekê din ku hûn pir caran bikar nayînin, biceribînin.



## Çarçove û Rênîşandan

Çarçove û rê bo zarokê/a xwe diyar bikin bi rêya:

### Rûtînên rojane, wekî mînak:

- ✓ sabit kirina rûtîna sibehê
- ✓ demên sabit jibo dersên dibistanê li malê
- ✓ planên êvarê yên sabit (mînak, xwendina çîrokan)



Têbînî: Ser çawa derbazbûna rûtîna rojane bi zarokê/a xwe re posterek çê bikin. Wê hingê zarokê/a we dizane ka dê paşê çi bibe û dikare li benda dema vala be.

### Tevgerê zelal û pêşbînî-kirî:

- ✓ Destûrên malbatê saz bikin
- ✓ Erk û wezîfan par bikin
- ✓ Jibo biserketînen biçûk jî pesnê zarokê xwe bidin



Têbînî: Bi hev re, bifikirin ku çima rêzik û destûran girîng in û çi diqewime dema ku endamên malbatê guh nadin rêzikan.

Tevî rûtînên rojane yên sabit, di jiyana rojane ya malbatê de hertim pevçûn bi gelemperî derdikevin. Di vê vîdyoyê de tête diyarkirin ku her carî, dema ku pevçûn heye, çi dibe:  
<https://www.hf.uni-koeln.de/41541>





## Piştgirîkirin di mijûlbûna bi hest de



Hemî hestan wateyekî ji wan re heye û dikarin li wir bin. Ew beşek ji jiyane ne.

Lê divê em hîn bibin:

- ✓ ku bizanibin em niha çawa hest dikin
- ✓ ku em her gav tavilê li ser wê tevnegerin

Wekî mînak:

Ji ber ku hûn ji tiştêk ditirsin, yekser nerevin an xwe neşeşêrin.



Ji ber ku hûn bi hêrs in, tiştêk tavilê neşikînin an kesên din neêşînin.



- Armanc ev e ku meriv hîn bibe ku bi hestên dijwar ên mîna hêrs, tirs û xemgîniyê re mijûl bibe.



Têbînî: Alîkariya zarokê/a xwe bidin ku peyvên pêwîst bibîne da ku hestên xwe bîne ziman. Li zarokê/a xwe mêze bikin û hestên xwe bînin ziman, wekî mînak.:

„Ez dikarim bêjim ku tu aniha ditirsî, rast e?“

„Ez difikirim ku tu niha hêrs î. Ew rast e?“

Jibo ramananên bêtir ka meriv çawa bi zarokê/a xwe re li ser mijûlbûna bi hestên dijwar re biaxive, hûn dikarin vê vîdyoyê temaşe bikin: <https://www.hf.uni-koeln.de/41541>

Girîng: li tevgera xwe jî binêrin û li hestên xwe temaşe bikin!  
 Bi vî rengî, hûn dikarin li ser hestên xwe bêtir hîn bibin û di mijûlbûna bi hestan de jibo zarokê/a xwe bibin modelek erênî.



Têbînî: Nexşeyên hewayê ku li ser rûpela din dibînin, li ser sarincoka xwe daleqînin. Pêşniyar bikin ku zarokê/a we, her roj dema ku ji dibistanê tê malê, li ser hesta xwe bifikire. Dûv re ew magnetekê datîne ser sembola hewayê ku bi hesta xwe re têkildar dibîne.

Bêguman hûn dikarin simbolên xwe jî bi kar bînin an jî bi zarokê/a xwe re bi hevûdu simbolên xwe çê bikin.

Daxûvaniya sembolan:

